1. Pirs: Dikarî me re pêş bikaranîna gazên Kîmyevî li ser Mîntiqeyî rizgarî agader bikey?

Bersev: Xebata me ji bona Demokrasîyê û Atonomî ji bona Kurdistana Îraqê ji mêj ve, weke hûn dizanin, dest pêhatîye kirin. Me ji neçarî bi darê zorê serê xwe li ber Rêjimên Îraqê dayite berzkirin. Ev rêjimên hanê Dewlemendîya Welatê me û bi taybetî Nefta Kurdistana me, a ku ew bêtir ji 9o. Melyon Ton Neft her sal têtê derketin, ji xwe re didin talankirin û bi serdejî Miletê me ji xwe re didin kole û bendekirin. Ew wî ji tevaya Mafeyê wîyî Mirovanî û Neştîmanî didin bê pêşk û parkirin. Weha bi vî rengî Miletê Kurd li Kurdistana Îraqê neçarî libexwrdanê ji bona man û nemanê xwe beramber bi Şovînîya Erebîyî Talankera Kurdistanê hatîye kirin. Vê xebata hanê ji sala 1918 de ji dema rûxandina Seleteneta Osmanî de di dawîya Cenga Cîhanîyî Yekem de û di pêla parvekirina Rojhilata Navîn de li ser bingehê Lihevhatina Saykês- pîko dayîte destpêkirin. Wehajî piştî ketina Şûreşa Ilona mezin di sala 1975 de me careke din ji nûve agirê Şûreşa Ilonî li ser çiya û di nava Dol û Deştên Kurdistanê de beramberî Şovînîya Talankera Erberî di 26. Gulanê Sala 1976 de date vêxistin. Careke din Miletê Kurd bi neçarî dûçarî li berxwedana man û nema xwe hate kirin. Dujmênê çavsor dixwest Kurdistanê ji Gelê Kurd bide valakirin. Wî bêtir ji Nîv Melyon Kurdên Bêguneh ji nava Xakê Bav û kalên wan bi darê zorê ew ji bona Jêrî Îraqê dane sorgonkirin. Da ku ew Kurdistanê bi carekê ji xwe re bidin talankirin û Miletê Kurd ji xwe re bidin kole û bendekirin. Lê vê carê jî mîna her car jî di mêjûwa xebata meyî dirêj de jî di seranserî mêjûwê de beramberî Dagîrkirên Kurdistanê de Miletê Kurd serê xwe ji Dujmin re neda tewandin. Wî agirê Şûreşa Gulanê li Kurdistanê date dadan. Roj bi roj topraxa xakê rizgarkirî Pêşmergên Qehreman, Lehengên Kurdistan bi xwîna xweyî pak ji bin gemara tapanên Faşîyên Ereb dane pak û Rizgarkirin. Weha bi saya mêrxasî û gernasîya Pêşmerge Topraxa Heremên Rizgarkirî li Kurdistanê bêtir ji Topraxa Libnanê, ango ji 10, 000 Km bêtir dihate derketin. Di nava vê Herema Rizgarkirî de hemû Pêşmergên Kurdistanî bi serbestî xebata xweyî siyasî û ya çekdarî li dar didan xistin. Wanan lêdanên weha tûj û bi ziyan her û hêr bi Sipahên faşîyên Bexdadê didan dan, ku Sipahê Dagîrker neçardibû, ku ew ji bona xwe Kurdistanê bi Goristan dida dîtin û wî bi hemû çekên wêrankirinêyî nuh nema dikarîbû beramberî Vîna Gelê Kurdistanê ji bona Demokrasîyê ji Îraqê û Ewtonomîya rast durûst, ji bona Kurdistanê bête rawestandin; ji ber vê jî vê Rêjima Hov di sala 1987 de û di sala 1988 de Kurdistana Ciwan bi Bombên Kîmyayî date barandin. Bi hezaran Xelkên Bêguneh ji Menal, Zarok, Pîrek, Kal û Pîr hatin kuştin û bi hezeran ji wan jî ji nava Heremên rizgarkirî neçarî duçarî revê ji bona Turkî û Îranê hatin kirin. Vê Rêjîma hanê bi vî karê hovî hanê tevaya Yasan, qanûnan û Peymanên Navnetewî li bin Tapanên xwe dane danîn. Peymana Cinêfîyî sala 1925 de ya qedexekirina bikaranîna çekên kîmyayî vê Rêjîma Sedamî Xwînrêj di ser guhê xwe re date avêtin. Wê di karanîna çekên Kîmyawî de tawnkarîyeke mezin nebes der barê Kurd de her wehajî dermabrê tevaya Mirovanîyê de anîye bikaranîn; ji ber vê jî ev Rêjima hanê ji nala Tawnkarê Cengê beramberî Mirovanyê li ser bingehên yasayên Nurinbêrgê têtê dîtin. Em bawerin, ku dê Miletê Kurd bi Taybetî û her wehajî Miletê Îraqê bigiştî dê vê Rêjîma hanê jî di encamê xebata xwe de ji bona sêr sergoyê mêjûwê nala Hitler, Musilînî, Firanko û Faşîyên din bide rêkirin.

2. Pirs: Di Minteqey rizgarî de rewşa gel ya aborî, sîyasî, leşkerî, rêxistina medresî û îdarî çawabû ?

Bersev: Mîna ku me li jor li ser Heremên Rizgarkirî dayite axivtin, careke din jî li ser vê pirsa we ez dixwazim bêjim: Ku di nava Heremên rizgarkirî de rewş û zîneta Gel di warê Abûrî de, Siyasî de, Leşkerî de, Rêxistina Xwendinê de û Serpereştîyê de pirî dijwar bû. Di her warekî de ji wan warên bi navkirî me ji bona çarekirina pirs û dijwarîyên wan bi dilsozî didan xebatkirin.

Li hemû Heremên Rizgarkirî Gel bi xwe desthilatîya xwe bi xwe dida kirin. Wî bi xwe bi azadî, serbestî xwedîbûna xwe dida kirin. Rewşa wîyî Aburî li ser Çandinyê û xwedîkirina Terş û Mer û Bazirganîya biçûk dihate kirin. Wan bi sadebûn jîyana xweyî rojane didan debarkirin. Şêweyî Jîndarîyê li nava Xakê Heremên rizgarkirî pirî dujwarbûn, lêbelê jî hemû Hêzên Welatperwerên Kurdistan ji bona xweşkirina jîna Neşîvanên van Hereman didan xebatkirin. Me, Partî, tevaya hêza xwe ji bona hêsankirina jîyana Gel dida tirxankirin.
Di warê Siyasî de Gel bi xwe wî ji xwe re Rêxistinên xweyî Sîyasî bi azadî didan helbijartin û şêwê kar wî ji xwe re dida danîn. Di warê Serpereştîyê de wî Encûmenên Serpereştîyê ji xwe re ji nava xwe û ji bona Serpereştîya xwe bi azadî dida helbijartin. Van Ecûmmenên hanê li gel partî di her warekî de bi azadî ji bona xweşbûna Rûniştvanên van Hereman didan karkirin. Her wehajî di warê Xwendinê de li gora tuwana xwe li gel Partî wan Xwendegeh ji bona Biçûkên Kurmancan didan vekirin û serpereştî lêdidan kirin
Di warê Leşkerî Parastina van Heremên hanê li gel Rûniştvanan bi hev re dihate kirin. Liberxwedan di pêşî de ji bona van Heremên rizgarkirî ji bona hostê Pêşmerge dihate ketin û bi dilsozî Pêşmerge bi tevaya karinên xwe ve li ber azadîya û parastina van Heremên Rizgarkirî didan dídan. Her wehajî Rûniştvanan ji bona Pêşmergên xwe rojekê ji rojan jî tirxemîn nedane kirin. Wan ew nala reşikên çavên xwe didan parastin û xwedîkirin. Pêşmerge ji bona xelkên Heremên Rizgarkirî bi xwe ew xebatkerbûn. Pirî caran, gava ku rê li Pêşmerge ji destên Şipah û Caşên Îraqî dihatin tengkirin, tevaya Xelkên Heremên Rizgarkirî, her yek li gora tuwana xwe bi lez û bez di hewara wan de dihatin. Weha Hêzeke xurt ji bona Pêşmerge di nava Xelkên Heremên Rizgarkirî de ji bona gûnê li ser xebata xwe ji bona Pêkananîna Demokrasîyê ji bona Îraqê û bi cihanîna Ewtonomîyî rast û durûst ji bona Kurdistanê dihate pêkahtin. Xelkên Heremên Rizgarkirî tevî nexweşîya şêwêyê jîyana xwe jî ew jî pir bi dilxweşî û bextiyarî jî di nava wan Heremên Rizgarî de dijyan. Ew bi wê jîyana dijwar û bi tirs serfiraz û serbilind bûn. Belê ew di nava Xakê Kurdistana xwe de serbest û azadbûn. Wan ev xakê Perest ji gemara tapênên faşîyên Sêwîyên Efleqî dabûn pak û rizgarkirin. Bayê azadî û serxwebûna kurdistanê di kar de di warê jînê de şev û roj bi kûrbûn ji nava nîvê cerg û hinavên xwe didan kişnadin. Bêhna vê azadîyê û serxwebûna hanê ji nava tevaya çiya û deştên Kurdistanê mîna bêhna gulan di buhara jîna wana de bi ser wan de dihate fûrandin. Tevî wan dijwarîyên bêjimarî jînê jî ew di nava wan Heremên rizgarkirî de pirî dilgeş, dilxweş û bextiyar bûn. Weha ger ku em neha li rewşa jîna wan Rûniştvanên Xelkên Heremên Rizgarkirî bidin temaşekirin, ji yên ku ew neha ji bona nimûne li Turkî penahide ne. Dê ji erdê tanî ezmanan cudabûnê bidin dîtin. Weha ji me tevan re bidîyarî têtê derketin, ku Buhara Jîna Mirovanîya me bi xwe ew azadîkirin û Serxwebûna Kurdistana me bi xwe ye. Bêyî vêna jî dê emê her û her jî di vê jîna hanê de jî li ser xakê xwe jî bende û kolebin . Hîç ne Mafeyê meyî Mirovanîyê û nejî yê meyî Milî.jî têtê dîtin; ji ber vê jî bi neçarî jî û bi darê zorê jî li ser me divê, ku em ji nû ve jî û careke din jî xakê xwe ji bin tapanên faşîyên Bexdadê bidin rizgarkirin. Evaya armanca jîna me bi xwe ye, na hêjî bêtir ev bi xwe Mirovanîya me Kurdan bi xwe ye.

4. Pirs: Çî muşkûlat li ber pêş damezrandina cepha Kurdistanî hebûn?

Bersev. Di tevaya dirêjbûna xebata meyî siyasî de ji berî sedan sal ve kurmê duberîyê û berberîyê di nava Welatê me de, di nav hestêyên laşên me de û di nava mejîyê me jî bi xwe de jî xwe dida xwedîkirin. Dujminên me her û her ew kurmên dara jîna me ji bona qazanc û berjewendîya xwe didan dermalekirin. Hemû serhiladnên me, hemû Raperînên me, hemû Şûreşên me bi van kurmên duberîyê û berberiyê pê dihatin lawzkirin û di encamê dawî de bi wan dihatin xistin. Ev rastîyên hanêyî pirî tirş û tal hêjî li ber çavên me dirin û tên.
Ji ber vê jî pir dijwarî ji bona pêkanîna Berekî Neştimanîyî Demokrasî her û her dihate pêşya me. Lêbelê jînê jî bi hemû ziravbûna xwe jî ji me tevan re

date derxistin, ku em bi duberî û berberîya hev hîç nikarin zora Dujminên xwe bibin û hîç jî em her yek bi tenha xwe nikarin ji bona biçûktirîn armanca xwe bighên gihaştin. Jînê bi neçarî, bi darê çû em dane hîn û fêrkirin, ku ji bona pêkanîna Bereki Neştîmanîyî Demokratîyî Kurdistanî ne bes tenê bi pêwistî têtê dîtin, lêbelêjî ew bi xwe man, û nema me bi xwe dide derxistin . Weha lì ser bingehê hîş, zanebûn, dilsozîya kurdistanê û berjewendîya Miletê me hemû ew kelem û kospên li ser rêya nehiştîna pêkanîna Berê Neştîmanîyî Demokrasî hatin hilanîn û Berê Kurdistanî hate pêkahtin. Bi vê yekîtiya hanê li ser qada xebatê li Kurdistana îraqê Tevaya Gelê Kurdistanê pêhate dilşad û bextîyarkirin. Me tevan bi hev re dikarîbûn wan kelemên pir yên li pêşîya xwe ji ber xwe bidin alîkirin. Weha bi vî rengê hanê rûpelekî nuhî geş û xweş di mêjûwa xebata me de hate destpêkirin. Em dê vî Berê Neştîmanîyî Kurdistanî mîna reşika ,çavên xwe şev û roj bidin parastin û her û her dê wê bidin geşkirin. Bi vê Yekitîya meyî perest bingehê bi serketina me bi kurttirin dem û kêmtirîn gorî ji bona serxwebûna Kurdistana me hatîye danîn. Evaya û bes ǝvaya dermanê derdê me ye. Ez hêvîdarin, tanî roja serxwebûnê ku dê her Layek vê yekîtîya hanê di asûyê asmanê Kurdistanê de ji xwe re bide berz û balakirin.

5. Pirs: Bi fikra me cepha Kurdistanî zor dereng sazbû. Hûn li ser vê çi difikirin? Sebeba dereng damezrandina cephê çî bû?

Bersev: Li gora bîr û bawerîya min jî Berê Kurdistanî pir bi derengî hate pêkhatin. xwezî jî ew jî ji zûvejî bihata pêkhatin! Lêbelêjî tevlivêjî em bi pêkhatina wî jî ji nehajî pir dilşad û bextiyarin. weke ku min li jor date xuyanîkirin, ku ev kurmê Duberîyê û Berberîyê di nava Civaka me de, belê di nava kurdistana me de pirî ji kevnar hatîye peydakirin. Ew bi xwe jî di rastîya rastîyê de bi xwe jî ji nava nîvê şêwê jîyana Civaka kurdistanê bi xwe têtê derketin. Belê pirî ratste, ku dujminên me di Şahînşahîya Sefewî de û di Selteneta Osmanî de jî ji xwe re ev Duberî û Berberîya nava me ji xwe re ji bona talankirina Kurdistana me û xistina raperînên me ji xwe re dane bikaranin, da ku ew hêzên me ji xwe re ji hev bidin tar û markirin û her û her serdarîkirina xwe di nava Kurdistana me de ji xwe re bidin dirêjkirin. Wan bi xwe ew deqa lawazîya civaka me ji xwe re datin naskirin û wan ew jî xwe re bi pirî û bi başbûn ji bona berjewendîyên xwe dane bikaranîn. Ev pirsa hanê jî tevaya Dilsoz, Zana û Hozanên Kurdistanê di seranserî Mêjûwa me de ji xwe re danekirin. Her yekî berseva vê pirsê li gora zanebûna xwe jî ji xwe re dayite dan. Berseva wê pirsê ji tevaya Kurdan re j Xanî bigir tanî neha jî pirî bi diyarî têtê dîtin. Ez li gora zanebûna xwe sebeba neyekitîya me Kurdan tanî neha di bingehê Ciyografîya Dorhêla Kurdistanê de dibînim. Li ser vî bingehê hanê tevaya sebebên din bi neçarî têtin avakirin. Lê vaye îro em dûr yanjî nêzîk guhertina sebeba Bingehîyî Ciyografîyî Dorhêlê li Kurdistanê dibînin. Rê û ban di nava çiyayên bilindî sextî Welatê me de têtin vekirin. Pirên biçûk û mezin li ser Çem û Rûbarên me têtin avakirin. Şêwêyê jîyana xwedîkirina Terş û Çandinîyê di nava Welatê me de dûr yanjî nêzîk bi xurtî têtê guhertin. Bazirganî û Sazkirin di nava Kurdistana me de têtê bipêşvexistin. Bazara Biçûkî têrkirî ji bona xelkê di nava Gund û Bajarên me de têtê hilweşandin û di şûna wê de dûr yanjî nêzîk Bazara Sermeyedarîyê cihê xwe roj bi roj dide xurtkirin. Ew tevaya pêwendîyên êlîtîyî kevnar ji hev dide tar û markirin. Şîyarbûna Milî li sernaserî Kurdistanê dide berz û balakirin. Duberî û Berberîya me bi hemû rûpelên avziravîya xwe ve, bi hemû tirş û talîyên xwe ve ew jî bona nava xaniyên antîkan dide rêkirin. Ev rastîya hanê ji me re bi darê zorê bi hinera pêşveçûnên qanûnên jînê Azadî, Serxwebûn û yekitîya Kurdistana me ji me re û her wehajî hêjî bêtir bi serdejî ji tevaya dunyayê re bi carekê jî piştî avêtina Rêjima îraqê bombên Kîmyawî ji bona nava kurdistana me dide mujdekirin.

6. Pirs: Em rewşa Partî Komînîst ya îraqê li ser pirsa Kurdistan da cîdî û samîmî ji dilva nabînîn ( ev ji siyaseta Partî Komunîsta ya îraqê wusa ye), hûn çawa ji mera cîh girtina Partî Komunîst ya îraqê di vê cephê da îzah dikin ?

Bersev: Xwezî we ev pirsa hanê ji Partîya Komonista îraqê bida kirin. Bêgûman dê wê baştir ji we re li ser siyaseta xwe derbarê Pirsiyarîya kurd de bi dûr û dirêjî bida kirin. Tevlvêjî em dilê we di vî warê hanê de jî nahêlin. Emê li gora zanebûn û bextê xwe perseva vê pirsa we bidin kirin.

ji roja Pêkhatîna partîya Komunistî îraqê her û her bêtir ji hemû Partîyên din li îraqê wê pişta xebata Gelê Kurd daye girtin û wê ji bona bi aşîtî û demokrasî çarekiriina pirsa kurd li îraqê dayite xebatkirin. Tevaya Mêjûwa Xebata Kurd li Kurdistana îraqê bi giştî û serpêhatîya partîya me bi taybetî ji me re dide diyarkirin: ku çend dostanî û hevaltî di navbera Partîya Komunist de û Tevgera Gelê Kurd de û Partî de xurt be, weha deha xebata tevaya hêzên demokrasî li îraqê xurttir û bi hêztir têtе derketin û pêrejî xebata Gelê Kurd geştir tête dîtin. Hêvîya guhertineke Demokrasî li seranserî îraqê bêtir pêşbîniya bi cihaîna wê tête dîtin.
Ev rastîya hanê ne bes tenê ji bona Tevgera kurd tête dîyarkirin. Her wehajî Partîya Komunistî îraqê jî li ser serpêhatîyên xweyî tirş û tal jî pê dide bawerkirin. Ji ber vê jî her guhertineke demokrasî û pêşveketineke Civakî jî li îraqê bê çarekirineke Demokrasî ji bona pirsiyarîya kurd li Kurdistana îraqê nayête dîtin. Çarekirina pirsiyarîya Kurd bi şêweyekî Demokrasî kilîta aramîyê, aşîtîyê, demokrasîyê, pêşvegetin û geşbûna Civakî li îraqê dide pêkanîn. Ev rastîya hanê jî ji Partîya Komunistî îraqê re roj bi roj bêtir tête diyarkirin. Ji ber vê jî ew li gel Hêzên kurdistanî jî bi giştî û li gel Partîya me bi taybetî jî pêwendîyên pirî xurtî dostanî û hevalbenditîyê dide danîn. Ketina partîya komunist ji bona nava Berê Kurdistanî beşekî giring ji xebata Partîya komunist li îraqê dide pêkanîn û ew bêyî vê Siyaseta hanê nikare bi erk û karên li ser xwe bêta rabûn. Hêjî bêtir Em bawerin, ku Partîya Komunist di rojên tên de dê deha jî hêjî bêtir bi neçarî piştî barandina Kurdistanê bi Bombên Kîmyawî ji bal Rêjima îraqê ve ji bona nava Kurdistanê dêhn û bala xwe û careke din jî ji nû ve jî li tevaya sitratîcîya xwe beramber bi Pirsîyarîya Kurd ne bes li Kurdistana îraqê, libelêjî ji bona Pirsiyarîya Kurd li tevaya kurdistanê bide temaşekirin û serpêhatîyân nuh jê bide wergirtin. Li gora bîr û bawerîya me ev rastîya hanê jî ne bes tenê ji bona Partîya komunistî îraqê tête xwestin, lêbelêjî bi neçarî jî neha jî ew ji tevaya Partîyên Komunistên wan Welatan tête xwestin, ji yên ku wan di nava xwe de Kurdistan ji xwe re dane perçekirin û bi serdejî dewlemendîya wê ji xwe re her û her didin talankirin û pêrejî Gelê Kurd ji xwe re didin kole û bendekirin, na hêjî bêtir ew dixwazin, mîna ku Dewleta îraqê dide kirin,, ku ew Gelê Kurd û Tevaya Jîndarîyê bi Bombên Kîmyawî û Biyolocî li ser xaka Kurdistanê bidin berbat û qirkirin. Ev siyaseta hanêyî nuh bi darê zorê li ser tevaya Hêzên Kurdistanî û her wehajî pêrejî li ser partîyên Komunistên îraqê, Turkî, îranê û Surî jî siyaseteke nuh dide neçarkirin.
Em bawerin, ku dê partîya konunista îraqê bi erkê li ser xwe beramber bi Gelê îraqê bi giştî û beramber bi Gelê Kurd bi taybetî bête rabûn.

7. Pirs: Em wek KAWA bi prensîb li dijî eleqe û danûstanddin li gel dewletên ku nav hevda Kurdistan bêş û kolonî kirine( Tyrkîya, îran, îraq û Surîya)
Hûn çawa li ser Partîyên Kurdistanê yên ku li gel îranê danûstandin û eleqe giredidin difikirin?

Bersev: Ez bawerdikim, ku hemû hêzên siyasîyî Kurd li seranserî kurdistanê ji sala 1514 de wan ji dil û canê xwe girêdana pêwendîyên xwe li gel wan Dewletan nedana girêdan, ji yên ku wan Kurdistan di nava xwe de ji xwe re dane parvekirin. Ev rastîya hanê jî bi hemû tirşbûn û talbûnên xwe ve divî li vê derê bête gotin. Pêwendîyên Kurdan li gel wan Dewletan ji neçarî, belê ji hêz û

hênerên kêrkirî di vê Herama me de û hêjî bi serdejî bêtir jî ji şêweyê parvekirina kurdistanê di nava wan Dewletan de dihate derketin. Ji ber vê jî wehajî hûn dibînin, ku we di vî warê pêwendiyên hanê jî tu tiştekî nuh jî ne daye dozandin. Ji bona numûne Xanî ji berî sêsed salî ve ev rastîya hanê bi hemû diyarî, dûrbînî û pêşbînî bi kûrî û qolî daye diyarkirin. Lêtevlivêjî li ser me tête neçarkirin, ku em ji dil û can li ser vê pirsa hanê bêtin rawestandin û berseveke rats û durûst û hêjî bêtir li ser bingehekî zanistî bidin kirin, da ku belkî em tev bi hev re jê sûd û kelk bidin wergirtin.
Pêwendîyên Partîyên Kurdistanî li gel îranê li ser têgihiştina van partîyan tête dîtin, ku ew ji nakokîya di navbera îran û îraqê de ji xwe re sûd ji bona bi cihanîna armancên xwe di îraqê de bidin wergirtin. Her wehajî Dewleta îranê jî ew dixwaze ji xwe re di rêya van Partîyên hanê de siyaseta xwe beramberî îraqê li ser berjewendîya xwe bide bicihanîn. Weha bi kurtî ji me tevan re bi sadebûn cewhera siyaseta van pêwendîyan tête derketin. Ev bi xwe jî ji me re û her wehajî ji Dewleta îranê re pir bi diyar têtê dîtin. Ev pêwendîyên hanê li ser karekî nîşankirî û di demeke nîşankirî de jî ji herdû layan re jî bi pirî diyar têtin danîn. Evaya jî bi neçarî li ser Hêzên Kurdistanî jî têtê kirin. Ev neçarîya hanê jî bi xwe jî ji tavaya kêrên kêrkirî bi Pirsiyarîya Kurd ve li seranserî Kurdistanê û bi parvekirina wêna ve têtê girêdan. Her wehajî ev pêwendîyên hanê jî ji şêweyî sitratîcîya meyî sipahî, a ku bi xwe jî li ser wê tevaya sitratîcîya meyî siyasî û aramancên meyî dûr û nêzîk jî têtin avakirin, bi xwe jî bi darê zorê têtin derketin. Serpêhatîya tevaya Mêjûwa xebata me ji me re tanî neha vê rastîya hanê dide derxistin: ku ji van pêwendîyên hanê Kurdan nikarîbûn jê sûdekî baş ji xwe re bidin wergirtin. Em wê çaxê, wê hingavê dikarin van pêwendîyên hanê bi başî ji bona xwe bidin bikaranîn, gava ku em tevaya sitratîcîaya xweyî sîpahî ji nû ve lêbidin temaşekirin û veguhertin. Ez gûman dikim, vaye jînê bi xwe jî bi avêtina Bombên Kîmyawî di nava Kurdistana me de bi darê zorê li me dide zorkirin, ku em bêvin yan nevin, ji bona man û namanê, divê em tevaya van pêwendîyan ji nû ve li wan careke din bidin temaşekirin û wan li ser bingehên nuh bidin danîn. Wê çaxê û wê hingavê ev pêwedîyên hanê dikarin bi qazanca kurdan bêtin dawîkirin. Wehajî li vir jî divê careke din jî bête gotin, ku Partîya me li ser vê pirsa hanê bi dûr û dirêjî jî di Rêbazê xwe de hatîye rawestandin û bîr û bawerîyên xwe têde bi diyarî dayite derxistin, yê ku ew ji bal Kongirê Nehemî Partî de di sala 1979 de hatîye bîryarkirin. Xwezî hûn careke din li ser vê pirsî li Rêbazê me bidin temaşekirin.

8. Pirs: Bi muweqet ji bibe mabeyna şerî îran û îraqê da, hinek Partîyên Kurdistana Başûr zor hesabên mûhîm li ser vî şerê da çekirin, lê belê Partîyên me yên Kurdistana Başûr di vî şerê da îstîfade nekirin, em bawer dikin ku hûn jî weha difikirin, dikarî me ra wan sebeban bejî?

Bersev: Belê raste Partîyên Kurdistana Jêrî hêvîyên pirî giran li ser vî şerê hanê ji xwe re didan danîn. Evaya bi xwe jî tiştekî pirî diyar dihate dîtin. Şerekî wisa giran hêjî di vê Rojhilata me de piştî Cenga Cîhana Yekem jî nahtîye dîtin. Du Dewletên Dewlemend di geşbûna bilindbûna buhayê Neftê de şer di navbera wan de têtê vêketin. Hêjî bêtir di pêla şûreşa îranê de Dewleta Sedamê Xwînrêj Hêrîşa Sipahî bi hemû Hêzên xwe ve bi ser îranê ve ji bona vegirtina wê û talankirina Nefta wê Mîna kurdistanê date rakişandin. Ma gelo di şerekî wisa de başbîniyeke baştir ji Kurdan re li Kurdistana îraqê nedihate dîtin? Raste li gora bîr û bawerîya min jî Partîyên Kurdistanê bêtir ji pêwistîyê hêvî li ser vî şerê hanê didan girêdan û hêjî bêtir wan bi xwe jî ji vî şerê hanê mîna bi pêwist kar û qazanc ji xwe re nedan wergirtin. Sebeba vê jî careke din jî li gora bîr û bawerîya min, ji wan sebebên li jorî hatine gotin, têtin derketin, lêbelêjî bi kurtî û giyaştî jî careke din jî ez dikarim bêjin: Netêgihiştina me hişt, ku em weha remanbikin û hêjî bêtir hişt, ku em weha reftarbikin. Hîvîdarim, ku em tev de ji vê serpêhatîya hanê jî ji xwe re sûd û kelk bidin wergirtin.

9. Pirs: Şerê Îran û Îraqê şerekî neheq bû. Bi fiqra me hêzên netewî ya Kurdistan bê teref bimana, ew eleqe û danûstandin li gel Îranê zor zererî dane xebata rizgarîya Netewayî Kurdistan.
Hûn çawa difikirin?

Bersev: Şer bi xwe di her kat û zemanekî de ew bi xwe nerewa ye. Lêbelêjî di seranserîya mêjûwê de şerên libexwedanê jî her û her jî ew têtîn dîtin. di 22. Ilûna sala 1980 de Sipahê Îraqê bi hemû hêzên xweyî leşkerî ve xwe bi ser tuxûbên Îranê de date rakişandin û Dewleta Îraqê Ceng li ser Îranê date dazanîn. Ma gelo evaya bi xwe ne vêxistina Ceng û Şer li ser Îranê bû? Ev Cenga cenawerî vêxistî li ser Îranê ji bal Rêjîma faşîyî Bexdadê ma çawa mero dikare wê bi nerewa li dar bide xistin? Tevlivêjî Partîya me di roja vêxistina qadisîya Sedamê Xwînrij de Daxuyanîyek di vî warê hanê de date derxistin û ev cenga cenawer ji bal Rêjîma Îraqê date tawanbarkirin, a ku bêtir ji Yek Milyon Ten têde ji Gelên Îranê û yê Îraqê hatin kuştin, Birindarkirin û tawîkirin û bi serdejî jî yek Bilyon Dolar jî ziyan bi herdû Dewletan ve hate ketin. Her wehajî divê li vir jî bête gotin, ku tevaya Hêzên Îraqîyî Beramber vêxisina Cenga Îraqê li ser Îranê ji bal Rêjîma Sedamê Tekrîtîyî Xwînrij bi tawanbarî ji tevaya Cîhanê re datin derxistin.

Li gor remana we divabû Hêzên Netewî Kurdistanî ji vê Cenga hanê bi layengerî bi mana. Ez dixwazin ji we re hinekî li vir bidin diyarkirin: Ku şerê me li gel vê Rêjîma hanê careke din ji nuh ve ji sala 1976 de hate destpêkirin. Şerê me di bin durûjmê Demokrasî ji bona Îraqê û Ewtonomîya rast û durûst ji bona Kurdistanê di 26. Gulana sala 1976 de hate vêxistin. Me şerê liberxwedanîyê li ber xwe dida kirin. Di tevaya yasa, qanûn û ayînrêyên Xwedanî de Mafeyê liberxwedanê ji bona her Mirovekî, her Miletekî, her Netewakî di vî dunya hanê de baramberî çavsorên xwe têtê dîtin. Ev liberxwedana hanêjî ji bona Mafeyê meyî Mirovanî û Milî ne bes/rew netê Mafeyê me ye, na hêjî bêtir ew bi xwe Erkê li ser şanê me bi xwe ye. Em nizaninin çawa Mero dikare di şerekî weha de xwe bê alî bide derxistin? Li gora Bîr û bawerîya me Mafeyê Newetê Kurd li Kurdistana Îraqê bû, ku ew li gel Îranê ji bona Rûxandina vê Rêjîma hanê bide kar û xebatkirin. Lêbelêjî divîjî livêderjî careke din jî bi diyarî bête gotin: Ku em û Dewleta Îranê li ser yek deqê bi tenha xwe bi hev dighaştin, ew jî rûxandina vê Rêjîma hanê bi xwe bû. Me her û her li gel Hêzên Demokrasî û Neştîmanîyî Îraqîyî din di Berê COT de ji bona Rûxandina vê Rêjîma hanê, ji bona Rawestandina Şer di navbera Îran û Îraqê de, ji bona pêkanîna Serdarîyeke Demokrasîyî Ligelhev û ji bona Ewtonomîyeka rast û durûst ji bona Kurdistanê dida kar û xebatkirin. Her wehajî livêderêjî careke din jî divê bête gotin, ku Pêwendîyên me li gel Îranê li ser ronahîya wan deqên jorî dihatin danîn. Em bi xwe nabînin, ku li ser bingehê van Pêwendîyan ziyan bi xebata me hatîye ketin. Şerê me li gel Serdarîya Îraqî bi gelekî ji van pêwendiyên me li gel Îranê kevtirin. Weha Şerê Kurd li Kurdistana Îraqê ji bona Mafeyê xwe ji sala 1918 de, ji dema rûxandina Seleteneta Osmanî de, baramberî Ingilistanê di pêşî de û di pişt re beramberî Rêjîmên Îraqî de tanî vê roja meyî nehajî hêjî têtê kirin. Rasete me nikarîbû bi başî ji vî şerê hanê jî sûd û qazancê ji xwe re bida wergirtin. Ev jî bi xwe jî ji bedbextîya nezanîya me bi xwe ye. Me sebebên vê jî li jor jî datin xuyanîkirin.

10. Pirs: Em wek gel çawa gehîştin qetlîama Halepce? Bi taybetî rola Îranê vê Qetlîamda çi bû? Eger rola Îranê vê qetlîame da hebu, eleqe danûstandina hêzên Kurdistan li gel Îranê çawa berdewam dike?

Bersev. Berseva beşî pêşî ji pirsa we, bê çawa em mîna Gel bi Kûştina Giştîyî Helebçe ve hatin gihaştin?. Di rastîya rastî de li ser min têtê divakirin, ku ez tevaya mêjûwa Kurdistanê û Xebata Miletê me li hemû parçên Kurdistanê jî ji we re bi dar bidim vekirin, da ku berseva vê pirsê bête dan. Lê hûn bi xwe jî

dizanin ev jî ji min jî bi xwe jî nayête kirin. Ez dikarim di pêşî de ji we re bêjim: Ji xwe re ji bona berseva vê pirsa hanê li Nivîstoka Mêjûwa Kurd û Kurdistanê bidin temaşekirin. Hîç gûman têde niye, ku emê bi dûr û dirêjî jî ji wê Nivîstokê bersevê ji xwe re bidin wergirtin. Lê tevlivêjî ez dixwazim ji we re bi kurtî, bi givaştî û hêjî bêtir bi gihaştî li ser vê pirsa hanê bêjim: Xebata me ji bon Demokrasîyê û Ewtonomiya rast û durûst weha li Kurdistana Îraqê hatîbû geş û gûrkirin. ku Rêjima Sedamê tekrîtîyî Xwînrij ne bi Top, Tank, bi Belafirên Cengînî, bi Mûşekan, bi Bombên Napalm, Fosforî û yên Goşînî, belê bi hemû Çekên Wêrankirinêyê Nuh nema dikarîbû Xebata meyî perest û bi taybetî jî piştî pêkhatine Şerê Kurdistanî jî bide şikenandin. wê çaxê wê hingavê Rêjima Sedam bi barandina Kurdistanê bi Bombên Kîmyayî date biryarkirin, da ew Delemendiya Welatê me û nemaze Nefta Kurdistanê ji xwe re bide talankirin û bi serdejî Miletê me ji xwe re bide kole û bendekirin. Evaya tevaya rastîya avêtina Bombên Kîmyawî û Biyolocî ji bona nava Kurdistana me dide derxistin. Weha vê Rêjima hanê ji Meha Nîsa sala 1987 de tanî Sebtemra sala 1988 de pir Heremên Kurdistanê bi Bombên Kîmyawî date barandin. Weha Helebçe di Avdarê de û li Behdîna di Awgost/Sebtemra sala 1988 de Bombên Kîmyayî ji bal Serdarîya Îraqê ve hatin barandin. Weke hûn dizanin, li Herema Bahdînan Serdarîya Îraqê piştî rawestandina şerê Îraq û Îranê Bombên Kîmyayaî beramberî bêtir sed Hezar Kesên Bêguneh ji Xelkên Heremên Rozgarkirî dane bikaranîn; ji ber vê jî bi hezaran Zarok, Menal, pîr û kal jî hatin kuştin û bêtir ji Sed hezar Kesî jî ji bona nava Xakê Turkî û iranê jî ji xwe re dane bazdan û li wê derê di rewşên pirî tirş û tal de dijîn. Ew li ber man û nema jîna xwe didin dan. Li vir ez ji we dipirsim, ma çi pêwendîya Îranê li gel vê barandina Bombên Kîmyawî tête dîtin? Ez gûmandikim, divê Miro tucarî Kirdar Pêkêrdar, yanî Sebeb û musebeb şûna wan bi hev nede guhertin, ger ku Mero bixwaze bi rastîyê bête gihaştin. Divê tanî Ku Kurd li ser rûwê vê Zemînê bêtîn jiyandin, tanî ku xwîn di damarên wan de bêtin gerandin, rojekê ji rojan, bêhnekê ji bêhnan vê kûştina giştîyî Helebçe û barandina Heremên Kurdistanê bi Bombên Kîmyawî ji bal Rêjima Îraqê nedin jibîrkirin. Divê li ser hemû Kurdan ji hemû Perçên Kurdistanê bi xwîna Zarok, Menal, Pîr û Kalên Helebçe bidin sûd û peym xwarin, ku ew dê, ger jî ku bi avê jî mabe, tevaya talankirina Kurdistanê û tola Helepçe ji Faşîyên Sêwîyên Efleq bidin sitandin.

11. Pirs: Paş qetlîama Helepçe du cîvînen navnetewî bona mehkûm kirina Îraqê pêk hatin, di vî herdû cîvînan da yekîtîya Sovyet li dijî mehkûm kirina Îraqê deng li gel dewleta Îraqê bikaranî.
Bêdengtî ya yekîtîya Sovyet û Welatên rojava li hember qetlîama Helepçe çawa dibînin? Hûn li ser Alîkarîya dîplomatîk ya yekîtîya Sovyet bona Îraqê çi komentarekî dikin?

Bersev: Li ser beşê yekem ji pirsa we em bi xwe neagehdarin.
Li ser bêdengîya sovyêtê me bi diyarî bîr û bawerîyên xwe û her wehajî rexneyên xwe jî ji bona Dewleta Sovyêtê dane diyarkirin. Welatên Rojava di vî warê hanê de dûr yanjî nêzîk bîr û bawerîyên tûrebûna xwe dane derxistin. Wehajî di meha yekem de ji sala 1989 de Kongireyekîyî Cîhanîyî Navdewletî li Parîsê ji bona qedexekirina Çekên Kîmyawî hate girêdan. Bêgûman bikaranîna çekên Kîmyawî ji bal Dewleta Îraqî ve tevaya Bextê dunyayê date hejandin. Cara pêşî ji bona tevaya dunyayê bi eşkerebûn hate diyarkirin, ku Xebata Gelê Kurd li Kurdistana Îraqê ji bona Mafeyî wîyî Milî nema bi çekên wêrankirinêyî " kevin" dikare bête sertewandin. Her wehajî ji tevaya dunyayê re hate diyarkirin, ku evêtina çekên Kîmyawî ji bona nava Kurdistan topavêtina siyaseta Îraqêyî Sipahî biramber bi Kurdan dide derxistin. Her wehajî ji tevaya dunyayê re vê avêtina çekên Kîmyawî ji bona Qirkirina Gelê Kurd li Kurdistana Îraqê ji bal dewleta Îraqê ve date diyarkirin. Vî karê dirhov jî ji tevaya dunyayê re bi darê zorê date diyarkirin, ku bangizandina Faşîyên Efleqî ji nava xakê Kurdistana me bi saya xebata Keç û Lawên me date bêtir bilezkirin û hêjî bêtir ji tevaya dunyayê re ji bona serxwebûna Kurdistanê date mujdekirin.

Li ser beşê siyem ji pirsa we weha mę nedîtîye; ji ber vê jî gotenek me li ser wê nîye.

11. Pirs: Em wek KAWA ji damezrandina xwe heta îro, hedefê me ya stratejîk Kurdistaneki serbixwe-yekhev û demoqrat e. Me xebat xwe bî wî hedefî ra girêdayî ye. Hûn li ser vê çî dibêjin?

Bersev: Weke ku hûn dizanin, Partîya me, Partîya Demokratî Kurdistan ji sala 1946 de hatîye damezirandin û wê jî dûr yanî nêzîk rêberîya xebata Gelê Kurd li Kurdista îraqê daye kirin. Her wehajê wê gewretirîn û dirêjtirin Şûreş di mêjûwa tevaya Kurdistanê dedayite lidarxistin. Em Partîyeke demokrasîne û Em ji dil û can bi bîr û bawerîyên Demokrasîyê di nava tevaya Civaka Kurdistanê de û di hemû warekî de jî pê bawerdikin. Ji ber vê jî em rêz û rûmetê li tevaya bir û bawerî û her wehajî li hemû armancên Partî û Sazmendîyên Kurdistanî li seranserî Kurdistan didin kirin. Her wehajî em vê jî li bîr û armancên we jî didin girtin. Her Pertîyek, her sazmendîyek li Kurdistanê dikare vê armancê yanjî ya din ji xwe re bide berz û bala kirin. Bîr û bawerîyên meyî xurtî bi demokrasîyê vê li ser me didin neçarkirin. Em bawerin, ku kûrbûna têgihiştina Kurdan bi bîr û bawerîyên demokrasîyê û fêrbûna wan jî ji bona wê dema gihaştina me ji bona Serxwebûna Welatê me dide kurtkirin û Gorîyên wê dide kêmkirin.

13. Pirs: Çawa ku hûn jî dizanin Celal ţalabanî çû Emerîka (USA) û hat, hûn çûyîna wî û hatina wî ya Emerîka ra çi dibejin?

Bersev. Belê min jî çûn û hatina Celal ji bona Emerîka jî bihist. Li ser vê çûn û hatinê jî ji bal min hîç tu gotin nayêtin dîtin. Ez gûmandikim, min hêjî ji kesekî jî çûn û hatina kurdan ji bona Emerîka nebihîstîye, ku ew jî hatiye qedexekirin. Çûn û hatin ji bona Emerîka tiştekî li ser xwe ye û her wehajî ew bi xwe jî mafeyê her Kurdekî bi xwe ye. Ji ber vê jî tu pewên min li ser vê çûn û hatinê jî nayêtin dîtin.

14. Pirs: Heta niha em dizanin ku tu Partîyekî Kurdistana Başûr li ser derheqa çûyîna Emerîka ya Celal Talabnî tiştek net got.
Hûn bi çiva girêdin û li ser vê pirsê çi difikirin?

Bersev: Em bi xwe jî bi rastî jî di mebesta pirsa we de hêjî nehatine gihaştin. Weke ku min ji we re li jor date dazanin, ku çûn û hatina Emerîka ji bona Kurdan hêjî ji bal kesekî jî nehatîye qedexekirin. Çûn û hatin ji bona Emerîka bi xwe ew bi azadî tête kirin. Li vir, li ser vê pirsa hanê jî tu remanên min li ser neyêtin dîtin.

15. Pirs: Em wek KAWA bi prensîbî li ser bingehîkî rast û dirust dosteyetî û eleqeyên qenc di mabeynî hêzên Kurdistan dixwezin.
Em bawerin ku Partî Demoqratî Kurdistanan îraq (PDK- î) jî waha difikire. Hûn di vê meselê da çi pêşnîyaran bona me KAWA û ji bona hêzên Kurdistanan Bakûr dikin?

Bersev: Em bi vê pirsa we pir kêfxweşdibin. Tevaya mêjûwa xebata me ji me re duberîyê û berberîyê bi hemû tirş û talbûna wan ve li ber çavên me dide danîn. Kurmê duberîyê û berberîyê di nava xebata me de her û her bi ziyanan wî dayite kêrkirin. Beş û bi tenha dermanê derdê nexweşîya lipaşvemayîn û bindestîya me di yekitîya me de têtê dîtin. Dujminên me her û her ev nexweşîya hanê di nava Civaka Kurdistana me de ji bona qazanc û berjewendîyên xwe dane geş û gûrkirin. Li ser me tevan têtê neçarkirin, ku em şev rojê ji bona yekitîya Hêzên Welatî ji bona gihandina armanca meyî perest di serxwebûnê de bi kurtirîn dem û kêmtirîn Gorî bidin kar û xebatkirin. Em ji dil û can di vî warê hanê de didin

karkirin, da ku Berê Welatî li her perçeyekî Kurdistanê bête damezirandin û xurtkirin. Her wehajî pêrejî û li gel jî em ji bona pêkanîna Berekî firah ji bona tevaya Hêzên Seranserî Kurdistanê didin kar û xebatkirin. Em di van Berên hanê de ji bona her perçeyekî ji Kurdistanê û her wehajî ji bona Berê Giştîyî Seranserî Kurdistan bes û bi tena biserketinê li ser hêzên Dujminên xwe Parvekirvan û Talankerên Kurdistanê dibînin. Hêzek bi tenha xwe nema dikarê li vî Perçî yanjî yê din bi vî karê Welatîyî perest ji bona azadî û serxwebûna Kurdistanê bête rakirin. Pêşneyara min ji bo we û her wehajî ji bona me tevan jî, na hêjî bêtir banga min ji bona her Kurdekî dilsoz jî: beramberî Dujminên Koledar, Talankerên Kurdistanê hevbigirin û bi yekbin. Evaya bi xwe banga Xanî ji bona me ye. Evaya dermanê derdê me bi xwe ye, na hêjî bêtir evaya bi xwe Mirovanîya me bi xwe ye.

16. Pirs: Bi fiqra me hemû hêzên Kurdistanê paş ew bûyerên dawî û paş qetlîama Helepce xettên xwe yên sîyasî û eleqe û danûstandinê xwe carêdîn kontrol bikin. Em dizanin ku hûn d vî meseleyî da baş difiqirin Ewa çawa bibe?

Bersev: Di seranserî mêjûwa Miletê me de ji pênc hezar sal û bi vir de hêjî wehajî rojekê jî ji rojan jî ew ber man û nemane xwe nehatîye ketin. Belê di mêjûwa welatê me de pir şer û cengên giran ji pêla Somerî, Elamî, Babilonî, Aşûrî, Akadî, Partîyan, Yonanî, Erebîyî Musulmantî, Mengolî, Turkî, Sefewî hd. hatine lidarxistin. Pir ji Xelên Kurdistanê di nava van Şerên sext û giran de hatine kuştin, Lêbeljî tevlvêjî rojekê jî ji rojan jî tev li hemû dirbûn û hovitîya wan Ceng û Şeran jî qirkirina Kurd û tevay Jindarîyê li ser xakî wî nehatîbû biryarkirin. vaye cara pêşîye di Mêjûwa me de ji bal faşîyên Şewîyên Efleq biryara qirkirina Miletê Kurd û tevaya Jîndarîyê li rûwê Zemîna Kurdistanê bi Bombên kîmyawî û Biyolocî hatîye dan. Rêjima Îraqê beramberî bi hemû yasan û qanûnên Navnetewî û beramber bi hemû Ayînrêyên Oldarî Bombên Kimyawî û yên Biyolocî di nava Kurdistana me bi ser Zarok, Menal, pîr û kalên meyî bêguneh de dide barandin, da ku ew Dewlemendîya Kurdistana me û bi taybetî Nefta Welatê me ji xwe re bide talankirin û bi serdejî Milet Kurd ji xwe re bide kole û bende kirin, nahêjî bêtir wî û tevaya jîndarîyê li ser xaka wî bide qirkirin. Ev hovîtîya bê numûne li Helebçe û li Behdînan û cihên din li Kurdistana Îraqê ji bal Rêjama Îraqê hate bikaranîn. Ev dir û hovîtîya hanê bi carekê me Kurdan li seranserî Kurdistanê me duçarî neçarî lêvegerandina tevaya Sitratîcîya xweyî Sipahî dide kirin, a ku li ser wê jî tevaya şêweyê Rêxistinên meyî Siyaşî û pêrejî Armancên meyî siyasî jî têtin danîn. Bi kurtî li gora bîr û bawerîya min, bext û zanebûna min ji me Kurdan re careke din ji nûve divê li tevaya Sitratîcîya meyî Sipahî, şêweyê Rêxistinên meyî Siyasî û armancên meyî siyasî bi dûr û dirêjî li wan bête temaşekirin û li ser van rûdanên nuh serpêhatî ji wan bêtin wergirtin, da ku em bi kurtirîn dem û kêmtirîn gorî bi armana xwe di Serxwebûna Welatê xwe de bêtin gihaştin: Ez pir bi bawermendim, Ku dê Miletê Kurdistanê di vê tengaya hanê jî ré bi serfirasî, serbestî û serbilindî bête derbaskirin û ew dê Xakê Welatê xwe ji bin tapanên Talankeran û Dagîrkeran bide pakkirin û wan ji nava Kurdistana meyî ciwan û şêrîn bide bengizandin û dê Kurdistan di nava Rojhilata Navîn de bi Serxwebûna xwe bête tac û xelatkirin.

17. Pirs: Em wek KAWA Peşmergeyên Kurdistan ezîz dibînin. Hûn dikarin li ser rewşa û quweta Peşmergeyan bi axifin, Berî Qetlîama Helepce çawa bû? Neha çawaye?

Bersev. Pêşmergên Kurdistanê li ber dilên hemû Kurdan pirî şêrinên. Ew şûr û mertalê jîna me ne. Ew sitûna hebûna me ne. Bêyî Pêşmerge Dujmênê çavsor û dir dê Welatê me bi carekê bide wêrankirin, Gelê me dê bi carekê bide kole û bendekirin, na hîjî bêtir dê wî bide qirkirin. Ji ber vê jî Pêşmergên

Kurdistanê bi erkê xweyî Mêjûyî bi mêrxasî û gernasî li ser çîya, li dol û newalên Kurdistanê beramber bi Dujminên Hov û dir radibe. ew jîne xwe, hebûna xwe ji bona rûmet û namûsa wî, ji bona bextîyarîya Gelê xwe dide pêşkeşkirin.

Avêtina Çekên kîmyayî li Helepçe, li Behdinan û cihên din mêrxasîya Pêşmerge nedaşînekandin. Lê em tev de dizanin şer beramberî Çekên Kîmyawî bi şêweyî şerê "Bav û Kalan" neme dikare bi xurtî mîna berê bête kirin; ji ber vî jî bi naçarî divê em şêweyî şerê xwe li serên çiyan, di nava dol, newal û deştan de bidin guhertin. li ser me divê, ku em şerên tên ji bona sitandina mafeyên xwe di nava Gund û Bajaran de û bi tabetî jî di nava Gund û bajarên Dujmin de bidin likarxistin û vêxistin. Bi vî corî li gora Bîr û bawerîya min dê pêşmergên kurdistan lêdanên pirî xurt û bihêztir ji bona dujminên Hov û dir bidin daweşandin.

18. Pirs: Hûn rewaş îronî ya kurdistanê çawa dibînin?

Bersev. Ger ku em li mêjûwa vî sedsalî dawî ji Xebata xweyî siyasî hûr û kûr lê bidin temaşekirin, dê emê di roja îro de pêşveketineke pirî mezin ji bona xebata xweyî neha bidin dîtin. Raste, xebata me hêjî pirî ji armanca xwedûr tête dîtin, lêbelê jî xebata me dergehekî fireh ji bona bi serketina wê tête dîtin. Şiyarbûna Milî li seranaser Kurdistanê rojekê ji Rojan weha nehatîye geş û gûrkirin. Wêna rojekê ji rojan jî lerzeke wisa mîna îro hêjî ji bona nava cerkûhinavên Dujmin nexistîbû. Avêtina Çekên Kîmyawî ji bona nava Kurdistanê ji tevaya dunyayê re topavêtina Siyaseta Rêjima îraqê bermberî sertewadina Kurdan dide derxistin. Her wehajî pêrejî berzbûna Vîna Xebata Miletê Kurd ji bona sitandina Mafeyê xwe tête diyarkirin. Rojekê ji rojan jî weha navê kurd li seranserî Cîhanê nehatîye berz û balakirin. Xelk cara pêşîye, ku ew di dunyayê de ji xwe didin pirskirin, Çima kurdistan bi bombêm Kîmyawî ji bal Rêjima îraqê tête barandin? Bi karanîna Bombên Kîmyawî ji bona tevga dunyayê metirsiyeke nuh dayite derxistin û bi tabybetî ji bona bi karanîna bêtir û bêtir di Rojhilata Navîn de dide derxistin. Hîç jî gûman lê nayête kirin, ger weha ev bête kirin, dê Rojhilata me piştî Cenga cîhanî duwem bi meydana avêtina bombên Atomî bête kirin. Em hêvîdarin, ku bikaranîna Bombên Kîmyawî dê li seransrî dunyayê bête qedexekirin.

Her wehajî ger ku em nehajî ji xwe re jî li Neqşa siyasîyî Cihanê jî bidin temaşekirin, ku tevaya siyaseta dunyayê li qazanca çarekerina pirsiyarîya. Kurd tête dîtin. Tevaya Siyaseta dunyayê ji bona demokrasîyê û bicihanîna Mafeyê Mirovanîyê dide xebatkirin. Wehajî ev jî bi palpêdaneke mezin ji bona gihandina armanca me di serxwebuna kurdistana me de ji me re dide yarmetîkirin. Her wehajî ger ku em jî li Serjimara Kurdan jî li Kurdistanê jî bidin temaşekirin, em dê Serjimara wan bêtir ji 25. Melyon kes bêtir bibînin. Ev Serjimara hanê dê piştî nêzîka 20. salên din bêtir ji 45. Melyon Kes bête derketin û nêzîka 40. salên din dê ew bêtir ji 90. Melyon Kes bête derketin. Weha ev Miletê mêrxas û gernas, ev Miletê bi nav û deng di Rojhilata Navîn de, belê Pahlewanên Rojhilata Navîn de dê çawa dewlemendîya Welatê wî bête talankirin û ma dê çawajî ew bête kole û bendekirin, na hêjî bêtir ma dê çawa ew bi Bombên Kîmyawî bête qirkirin?
Ez Sererxwebûna kurdistanê bi saya qehremanîya xebata kurd dibînim. Serxwebûn bi xwe ji bona hemû Miletan li sernaserî dunyayê mafeyê wanî serûştî bi xwe ye. Ev Mafeyê hanê bi xwe jî nayête dan, lêbelêjî ew bi darê zorê tête sitandin. Dara Azadîyê bi xwînê tête avdan.